

ROJA NÛ

Kiriyariya Roja Nû: ji bona erdên Sûriye û Li-bîyanê: 15 lîreyên Sûrf: ji bona welatên din 2 lîreyên inglîzî. Bihayê Hejmarekê: 15 Qemerî.

Dîwan û gerîndekariya Rojname: Bêrût-Birc; Wêqîf Tabet, Telefona Dîwana: 74-04; Telefona Mala Xwediyê Roja Nû: 84-41. Edresa telg: Bêrût-Rojantû.

XWEDÎ Û GERINENDE: MÎR Dr. KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN

KURDISTAN

DER ENIYA PESIFIKÊ

Kurdistan û Welatê Rohelatê Navîn

Kurdistan hestiyê welatê Rohelatê Navîn e zîne ye. Piraniya çiyayên bilind û çeleng yên ko ji Behra Reş — di nîzkî Qeqaşê de — heta xelîca Ecemistanê dirêj dibin, çiyayên Kurdistanê ne, û li roavayê welatê Kurdan de, deştine bi av û kanî, deştine mezin û tîr zad û dexil hene.

Di axa Kurdistanê de nijadekî bitenê rûdine, ew jî nijadê Kurd e. Kurd mîrxas û xebatker in û ji neh milyonan bêtir in; ew hejî azahî û serbestiyê dikin, xwediyê gotina xwe ne, dilvekirî ne, xudanbext in, qedrê xerîba digirin, têkîlî dîn û karê cîranên xwe na bin, û heqê cîranên xwe nas dikin: bav û kalên wan wiha bûn, ew jî fro welê ne.

Ji sarîsibeha dinyayê, ji demên destpêka tarîx û dîrokê û vir da, kurd di Kurdistanê de rûdîniştin; fro jî tî de rûdînin û xwediyê erdê xwe ne. Çav û dîroka cihanê ew li wê erdê dîtine.

Zîman, xwîn, nijad, tevger, rabûn û rûniştin, wan ji cîranên xwe vediqetîne. Cîranên wan li roavayî tirkî, li bakur-rohelatî û rîs, li rohelatî ecem û li nîroyî ereb in.

Hemî axên Kurdistanê pev re girêdayî ne, ev perçeyek bi serê xwe ye; û maldarî, paşrojmendî, mal û dewlermendîya Kurdistanê tîrî wê dîke û besî we ye.

Bêşîk, Kurdistan rojêkê di rewîş û jiyîna nijadên welatên Rohelatê Navîn de, karekî mezin û girane wê pêkîbîne.

Sinorên Kurdistanê

Li roavayî xezekê ko ji çiyayê Kurmanca — erdê Suriyê — derdikeve û di bakurî de ji Killis, Meraş, Elbistan, û Divrikê derbaz dibe û digebe ava Kelkitê.

Di nîro roavayî wê xezê de gund û garistanên kurdî hene û ew digehin heta xelîca Skenderonê — Behra Spî —.

Li bakurî: xezekê ko di ber ava Kelkitê re dirêj dibe, ji rohelatê bajarên Beyburtî û Oltîyê dibore û digebe Qersê.

Di bakurê wê xezê de jî kurd hene û gundên wan digehin heta Behra Reş.

Li Rohelatê: xezekê ko ji Qersê derdikeve û ber bi nîro-rohelatî ve dirêj dibe û piştê rex qeraxên gola Urmiyayê ên roavayî û ji rohelatê erdên Loristan û Bextiyara û Sine û Kurmançaxahê — Kirmançaxahê — dibihore.

Li nîroyî: xezekê ko ji Loristana Nîroyî derdikeve û ji bakurê Xaniqînê û Kîfrîyê derbaz dibe û ber bi nîroyî ve tî de digebe heta çiyayê Hemrînê û jî ber bi roavayî ve difitile û ji nîroyê çiyayê Şingalê — Sincarê — dibore û di nîzkî Şerablîsê de digebe ava Feratê.

Tixwên Kurdistanê ên Siyasetî

Berî şerê mezin — 1914 — 1918 — axa Kurdistanê destê hikûmetên Osmanî, Ecem û perçakê jê di bin hikmê Urîsa de bû. Piştî wî şerî gava hikûmetên Ewropayê ên mezin û tîrka bext danîn nav xwe û pê li hev hatin, erdê Kurdistanê di nav bira dewletên Tirk, Ecem û Iraqê de hatiye par kirin.

Di Sovyetistanê de bi tenê sed û çêst hezar Kurd hene û ew bi artîkariya hikûmeta rûsî pêş ve çûne û di pîrsên zîman û zanîna de xwediyê azahî û serbestiya xwe ne.

Ji axa Kurdistanê ya ko ketiye destê tîrka, li aliye nîroyî perçeyekê dirêj jê hate bîrîn û ket bin hi kîmaraniya Frensê ya erdê Suriyê.

Sinorên Tirkîya û Iraqê bejma Kurdistanê gikestiyê û pêşveçûna mîletê Kurd bi salan ve paş de bihiştîye. (Encyclopedia Britanica; çap 14, Sernav — Mossul)

Erdnigariya Kurdistanê a Beşên û Hatînen Wê:

Kurdistan erdekî tîr çiya û zozan e; lê deştên fireh û feyizdar jî tî de hene; xesma deştên Pasîn Mûş, Xerpêt, Cizîr, Diyarbekir û neval û navdeştên ava Dicle û Fîratê bi nav û deng in.

Xelkên Kurdistanê jî her tiştî bêtir bi cotkariyê mijûl in, û di axa wan de her texlîf zad û dexil digehin; rez û bîstanên wê jî heja ne; çeh, genim, garîs, titin, her texlîf dar, giya û heşnati, behîv, hejîr, goz, sêv, karçîk, mîşmiş, hox, hirmê, gilyas, tîrî, tu, hinar, zeytûn, zebêç bi piranî çêdibin û gelek tamdar in.

Pez û dewarên Kurdistanê jî zehfîn û çêreyên di wê xurt in û tîrgiya ne.

Erdê Kurdistanê teji madenên heja û giranbiha ye, lê di nîzkî Diyarbekirê de paxir û di Kurdistanê nîroyî de kaniyên gazê — yên ko bi navê gazên Mûsilê û Iranê hatine nas kirin — pê ve madenên wê ne hatine vekirin û şikulandin; di axa Kurdistanê de hesin, berê komirê, paxir, sîfir, tûtîye, rayên renga, zîv, zêr, zirç û jî zehfî texlîtên din madenên qîmetgirîna peyda dibin.

Di Kurdistanê de hin karxaneyên çav û qîmaşa hene, û di mala de xelk bi her texlîf destxeta mijûlî dibin; jî hîrî, pembû, kitan, û hewrûşimê, eba, betaniye, mexfûr, mêzer, cicim, xalfçe, çav û qîmaşa û bi çerm û eyara û jî dar, ax, kevir, hesin, pola zîv û zêrî pir tiştîna çeleng û bêjayî çêdikin; jî xwe polayê Kurdistanê, zîvker, û zêrkerên wî erdî, li dinyayê bi nav û deng in.

Kurdistan zehf hîrî, mûyê bizina, berû, gezû, masiyên xweykirî, pez û dewar, çerm û eyar, rûn, penîr, giyayên dermana, fêkî, hingivî, titin... digîne bazarên cîrana. Di Kurdistanê de jî bîstan bêtir bajar û garistanên mezin hene, xelk û

WEŞINGTON — Refên emerîkanî jî nû ve li giravên Ponapê û Kusaiyê xistine, li rohelatê Karolinê, giravên jî yên Orta Pesifîkê ko di destê Japona de ne. Çetê emerîkanî ê hewayî 30 ton bombe berdane hêjagehên Japona.

Serfermandarê stola emerîkanî Emîral Çester W. Nimitz di civanê rojnamevanan de gotiye: Dilê me teng dibe ko em nikarin rastî çongkeştiyên Japonî ên mezin bîn, noqavên me hinde zehf gemiyên Japonî ên bar û banzînkêş bin av kirine ko stola Japonî êdî jî bona geşt û gerên dîr û dirêj, tiştên ko hewce ne nikare bi xwe re bigerîne an bîne, û wilo dixuye, beriya ko emê bikevin heta kezeba Pesifîkê Japona yekîneyên stolên xwe ên mezin, li wê deryayê bi şûnda kişanîne. Emîral Nimitz jê pê ve da zanûn ko girava Majuroyê, li nîroyê giravên Marşalê ketiye destê qîwetên emerîkanî.

BERN — Radyoa Elemanî dide zanûn: Ordiya elemauf xwe jî bajarê Umanê bi şûnda kişandiye.

MOSKÛ — Yekîneyên Ordiya Sor Uman standiye.

CEZAYIR — Qerargeha Hevalbendan a mezin li Eniya Behra Spî dide zanûn: duhî tevdana kewte û sedmêran dom kiriye, nexweşiya hewayî li reşayîyê qelqên eskerî ên mezin aciz dîke.

Refên Hevalbendan êrîşî bendera San Stefano û bajarê Mont-Aldo di — Kastroyê kirine. Bombeavêjên me ên sivik di nîzingî Kampô — Leonê de li gârgêh topçiyân û li rêhesinên erdê Kapanîkayê xistine.

Ji aliye dîm refên me bi ser qada şerî re fîriyane û karê xwe ê dîdevanî û nobetdariyê pêk anîne.

Yekîneyên çetê Hevalbendan duhî 900 cara bihewa ketine. 30 balafirên dijîmina, di sêr serpîrê re hatine dîtin.

LONDRE — Bombeavêjên britanî seveçûyî di Frenseyê de li Karxaneya balafirên a Marinyanê xistine. Raporen pêşîna xuya dikin ko derba xweg çîhên xwe girtine.

LONDRE — Eskerên Hevalbendan jî destpêka cengê erdê Italyayê û heta niha 15.000 eskerên elemanî heşîr girtine.

BER BI SERFIRAZIYÊ VE

Hefta borî yekîneyên Ordiya Sor Uman xelas kirine. Şerê ko niho çêdibe, ne şerê paqîjkirina erdê Sovyetistanê ye. Ordiya Sor di nav axa Polonyê û hikûmetên Baltîqê de û li nîroyê, ber bi sinorên Romanyayê ve pêş ve diçe. Şer hêdî, hêdî digebe erdê Belqana. Ji xwe êrîşa sovyetî a havînê, di nav berf û baranên zivîstana nê de jî, bi awakî bruskin dom kiriye û li devê deriyê biharê de jî, ev êrîşên he, bi xurtiya ko sist bun çîye nas na kin, dom dîke.

Êrîşên Hewayî: Refên Hevalbendan piştî bombardimanên bajarên elemanî ên mezin, bombardimanên ko hêj dom dikin, ev du roj in zor didin hêjagehên elemanî yên peravên Ewropa Roavayî.

Bombeavêjên giran di nav du rojên dawî de, du cara li Pa-de Kaleyê xistine.

Wilo dixuye ko neçîrvanên elemanî di şerê berevaniya erdê xwe de sist ketine, û di nav sê rojên dawî de, di ser hêjagehên erdê elemana û ên vegirtî re bombeavêjên britanî û emerîkanî rastî neçîrvanên elemanî ne hatine. Ji xwe çetê Hevalbendan ê hewayî, bi bombardimanên dawî, dixwestin bigehin du armancan: bêmecal xistina karxanê û kar û barên elemana ên eskerî û şkenandina neçîrvanên wan.

Ev her du tişt niho pêk tî. Itewîşa dest brayên biçûk: Pêşve çûne Ordiya Sor a dawî serekên Bîzarîstan, Romanya û Mecarîstanê, xistine tengiyêke dijwar. Ordiya Sor mîna bedenek pola pêş ve tî û li tu derî elemana nikari bûn, ber ve hatina wê bisekinine. Halê Fenlan dayê ê dijwar jî di pêşiya wan de ye.

WEŞINGTON — M. Edward Stetînus duhî gotiye ko ewê bibe serekê kardariya emerîkanî ya ko ji bona peyivên ser pîrsa petrolê wê bête danîn.

CEZAYIR — Komîte frensîz a xelasiya Welêt îro serê sibehê, di bin serekîya General De Gol de civanek danî.

LONEDRE — Pêşveçûna yekîneyên Ordiya Sor di axa Krivoy Rogê de dom dîke, xetên elemana li zehf deran hatine neqeb kirin.

LONDRE — Duhî jî bombardimana hêjagehên axa Germanîstanê û yên vegirtî, bi destê refên Hevalbendan, dom kiriye.

LONDRE — Ingilîstanê de ji bona bar û rewîngîyan heft texlîf balafir tîne hazir kirin. Piştî şerî ew balafirên he dest bi xebatê bikin.

LONDRE — Danezana elemanî mukir tî ko Xerson ketiye destê Ordiya Sor.

MOSKÛ — Du sed û heta sê sed hezar eskerên elemanî — angû 20 û heta 30 firçe — di enîşka Dnîpre de tengiyêke giran de ne. Her wekî yekîneyên Ordiya Sor di nîroyê Umanê de, ber bi Bugê ve dimeşin, dera qîwetên elemanî her dom dikare bête girtin.

rûniştîmanên wan jî 30 û heta 50 hezar in.

Bajarên Kurdistanê ên mezin di Kurdistanê Roavayî de ev in: Diyarbekir, Merdîn, Xerpêt, Meletîye, Erzerûm, Erzîngan, Mûş, Wan, Bitlîs, Rohe...
Di Kurdistanê Rohelatê de: Sewîşbilax, Sine, Kurmançaxah Seqîz, Urmiye...
Di Kurdistanê Nîroyî de, Silîymanîye, Kerkûk, Zaxo, Rewandîz, Koysenceq, Hewlêr, Amedî...
Bajarên Kurdistanê ên mezinîr in:

DEMA NIHA

GOTARA GENERALÉ ELEMANI

LONDRE— Duht évaré pêşekaré elemani é eskerî General Dîtmâr di Radyoa Berlîné de qala rewîşa eniya Ukranyayê kiriyê û gotiye: Bê şik niho barê me é giranîr di eniya rûst de ye. Nayê inkar kirin ko serfermandariya sovyetî piştî ketina Jitomirê bi şehrezayî û hinerwerî karên erîşên xwe gerandine.

Qiwetên rûst pêş ve dikevin, û rewîşa Ordiya me zehf giran e. Ji aliyê din qiwetên rûst Uman standine û cengên ko Tarnopolê de çêdibin, xurtiya pêşveçûna yekneyên rûstî hêj bêtir têxe ber çavan.

Wext divêlin heta ko Ordiya me bikare xwe ji vê tengasiya giran xelas bike. Herî, herî hikmî qada şerî dike, herî çûn û hatin û kom û kar û bar bûna eskerên me bi çûnda dihêle, lêbelê ew arîkariya qiwetên rûstî dike.

General Dîtmâr, bi gotinên xwe, rewîşa Ordîyên elemani ên dijwar, pêş xelkê dike.

MOSKÛ— Rewîşa elemana di nav 24 saetên dawîn de der Ukranyayê zehf giran bûye; Ordiya sor erîşa xwe pêş ve dajo û bi firqeyîne nû—anî dirêjî elemana dike.

LONDRE— Di nav du rojên dawîn de refên brîtanî û emêrikani jî nû ve bajarên elemani ên mezin, Stuttgart, Munx, Ulm û Ewsburgê bombardîman kirine. Qiwetên brîtanî jî hezar balafirên bihevketî dirêjî wan hêjagehan kirine.

Moskû— Yekneyên Ordiya Sor di axa Proskurov, Vinitza, Apniarka, Kirovograd û Nikolafê de pêş ve dikevin, û elemana dişikînin. Rêhesina Odesa—Lwowê hatiye birin.

QEWIL

QEWILÊ ŞÊX EBDILQADIR

Li ber hisn u cemala te
Çavê di reş u xiyala te;
Çi qeyis bêjim navê te ye.
Xêyr û berket zozanê me ye
Ya ho, ya Geylanîl..
Buxdad burcê ewliya ne
Kerkûk çihê cudiya ne
Mûsî textê eabiya ne
Cizîr meqamê u-ema ne.
Tillo çihê qasida ne,
Stenbûl textê her Siltan e;
Mizgîn geriya li nav gêxa ne;
Ebdilqadir bu Siltan e.
Bû Siltanê ber û behran e.
Çûm Buxdayê çar derî ne,
Her çar derî qubletî ne.
Çar qutbê Kamil lê rûniştine
Ya ho, ya Geylanîl.
Çûm Buxdayê her dem li pêş,
Hero diçim tê me derwêş.
Heger tu gêx î, medhan bibêj,
Li ser cemala te, ez bûm kher
û gêj
Ya ho, ya Geylanî, ya Geylanîl
Ostayê min tu î, narafê min tu î,
Ya Xewse li germiyane;
Ji Buxdayê derketî der e,
Ser u bîst derwêş, li ser defter e
Buxdad standî, bi gulek zer e
Ya ho ya Geylanî, ya Geylanîl..
Li Nisêbîne Zeyn Abdîn e
Ewê li Şamê, Şêx Muhiyedîn e
Destûr ya Geylanî, ya Geylanîl..
Ez ban te dikim, tu dey na kî
Tu bi qedrê Mihemed, Mistefakî,
Roja li heşrê li me bi ria kî,
Reca me ji Xwedê û pêxemberan kî
Ya ho, ya Geylanî, ya Geylanîl..

QEWILÊ WEYSUL QERANÎ

Weysul Qeran bazê zer e
Li ser qumbetê derket der e
Destbrayê pêxember e.
Weysul- Qeran bazê sipî ye
Kerim-Ullah, rehîm-Ullah
Rehmet li Weysul Qeranê.
Ezê sed salê li dinyê bim
Bi ziv û zêr xanlê bim,
Şevkê mêvanê qebrê bim.
Hey min çi kîrî, min çi biderda
Sifê sohûr bu, bi zêrê werda
Rehmet li Weysul- Qeranî heyl..
Emê dimirin roja çara
Wê me deynin ser best û du
dara
Emê dibin mêvanê mişk û mara
Goştê me bixwin teba û heywana
Silav kir li hêtê wan diwara.
Tirba min î çend î dirêj e
Têde ye marekî kher u gêj e
Dixwe goştê merevê tarik setat.
Tirba min î, li nav tirba ne
Dilopek, hati ser çavan e
Ev ezabê dê û bava ne.
Dilopek hati ser eniyê
Ev ezabê cîrantiyê
deçî lîmêja hindîk teksîr e
Açîrê celheane, xweş wezîr e.
Wek xinzîrê sto bi zencîr e.

Derdê dilê min

Dilbirin bûm ez ji derdan, min ji ber fikran
û jar
Şev û rojên xew tu nîne, nîn li yek qîr
û hewar
Sed dax û sed key li snim jê dinalim,
pir gelek
Hêstîrên çavan dinalim, rengê barana
bihar
Miletê kurd maye bes evja û dil, û qels û kher
Ev çî jin e, em dibîtin, di bin dest û pê
neyar
Serê xwe rake ji xewa xefletê, carek binêr
Roj ji bîrcê derhiate, gulşê bû çol û beyar
Berî ko roj derkeve miletê dinya ser xwe
bûn
Miletê kurd bes tenê mîna werisê bin
dstar!
Dijminê kurd e ji dil bê xwende û bê ser-
xwebûn
Lê divêlin bome her dem, em hemî tev
bin şivar
Edî bes îret bikêşin, dil li min bûye
birin;
Jin li min bûye bela, lê can li min bû tar
û mar.

AMÛDE: NAYIF HESEN

BOMBARDIMAN

LONDRE— Herî brîtanî û emêrikani ev çend roj in, hêj bêtir zor didin hêjagehên elemana yê peravên Ewripa Roavayî û rê û rêhesinên ko ji axa elemana ber bi roavayî ve dirêj dibin.

HEVAL

Eman heval eman heval
Ji ber derdan bûm pîr û kal
Di bin destê neyaran de
Nexweş ketim, bê mah û sal
Nexweşdarê meh û sal im
Ji ber jana dil dinalim
Meger dixwîn, bi geş bûye
Wekî bilbil her dinalim;
Gelf xortan wekî şer bin,
Divêtin, em hemî bi kêr bin
Ma ne bes e eşa evîn
Ji ber kulan ketim nivîn
Bi salan pîr nexweş ma bûm
Lewra dilê min bûye xwîn.
ÛŞÊ HEÇÎ HERSAN


MIREKA CIHANE

MIREKA CIHANE MIREKA WENEYEN SER O ASITIYE

CENG & BIHINGEH HATINA GENERAL BEYNE



1 — Nimîndeyê Frensê li Sûriye û Libnanê û Serfermandar General Beyne. Ji aliyê çepê ber bi rastê ve zabîte sîsiyan Komandan Lakriwa ye, dostê me é delal.



2 — General Beyne û Serekcimhûr Şikrî Beg Qiwetlî pev re daxêvin.



Serekcimhûrê Libnanê Mirza Şêx Bişara Xûrî û Serekwezîrê Libnanê Mirza Riyad Beg Silih û Wezîrê dervekarîyê Libnanê Mirza Selîm Teqla çûne xatîrxwaziya General Beyne.

Ji Qeragêha Hevalbenda a mezin li Italyayê: Duht bajarê Kasinoyê bi awakî zurt, û heta niha di eniya Italyanî de ne difî, hatiye bombardîman kirin. Çekê hevalbendanê hewayî 3.000 caran bi hewa ketiye û ji serê sibehê û heta nîroyî li vî bajarî xistîne. Refên hevalbandan li erdê ko 1.800 mêtir çar goşê fireh e, 1.400 ton bombe avêtine. Qesda ve bombardîmanê xira kirina topên elemani bû.

Piştî vê lêxistinê topçiyên emêrikani û brîtanî dest bi bombardîmana çepê û kozîkên dijminê kirine, û peyadeyên Hevalbendan rabûne erîşan.

MOSKÛ— Ji 6 ê Adarê û heta donzdehan yekneyên Ordiya Sor yê eniya Ukranya sîsiyan 155 tang, 390 topên navhincî, 64 topên mezin, 230 qumbereavêjen çeperan, 950 mîtralîyoz, 68 otomobîl û kemyonên zirb kirî, 57 traktor û 3.830 otomobîl xira kirine û 87 tang, 50 topên gir, 338 topên hûr û navhincî, 142 qumbereavêjen çeperan, 1.077 mîtralîyoz, 8.200 tîfing û otomatîk, 24 otomobîl û kemyonên zirb kirî, 121 traktor, 5.342 wagon û gelek çek posat û zad û zexîre ji dest ve girtine û 2.000 eskerên dijminê hesr kirine; 20.000 kuştîyên elemana li erdê mane.

LE JOUR NOUVEAU

Direction : Beyrouth Wakfs Tabel
Place des Canons Tél. 74-04 et 84-41

QUOTIDIEN KURDE
Directeur - Propriétaire: EMIR DR. KAMURAN AALI BEDIR KHAN

Le Numéro 15 P.L.S. - Abonnement
Syrie-Liban 15 L.L.S. Etranger 2 L. Stgs.

KURDISTAN

- III -

RÉLIGION

Les Kurdes sont en grande majorité musulmans sunnites, de rite chaféite. Seules, quelques rares familles princières, comme celle des Ardelan, en Iran ont, pour des raisons politiques, adopté le chiisme.

Elles n'ont pas été suivies dans cette voie par leurs sujets, et il en est résulté pour elles une perte de prestige, bientôt suivie de leur chute.

Signalons également l'existence, au Dersim, d'une secte encore très mal connue, mais de tendances chiites extrémistes, celle des « Qizilbach » ou « Alawi ».

On trouve aussi des Kurdes chrétiens, ils sont de rite jacobite, nestorien ou arménien. Il est impossible de terminer ce paragraphe sans citer la curieuse communauté des Yezidis, jadis fort nombreuse, moins importante de nos jours, mais encore représentée par quelques groupes assez considérables dans les régions de Mossoul (au Cheikhan et au Djebel Sindjar), d'Alep (Kurd Dagh), de Nissibine et de Tiflis. Certains voient dans cette religion un dernier vestige du Zoroastrisme ; elle est, en réalité le produit d'un amalgame de très vieilles croyances indo-européennes, de survivances gnostiques et de doctrines islamiques très déformées. Elle admet l'existence d'un Dieu, assiste de sept anges, dont le principal, Tawusé Malak, l'Ange-Paon, n'est autre que Satan repenti et rentré en grâce. Ainsi, loin d'adorer le diable, comme on le croit trop souvent, les Yezidis nient son existence ; pourtant, ils n'ont pas su tirer d'un tel postulat toutes les conséquences qu'il devrait logiquement comporter, puisqu'ils continuent à accepter la notion du bien et du mal, et qu'ils croient à la métémpsychose, purificatrice des âmes.

Musulmans, chrétiens ou yezidis, les Kurdes n'attachent guère d'importance à la pratique journalière de leur religion, et les représentants des trois confessions font bon ménage à l'intérieur de nombreuses tribus mixtes. Il est cependant intéressant de noter que, chez tous, les dignitaires religieux sont l'objet d'une profonde vénération, sans doute parce que les fidèles, par trop négligents de leurs devoirs sacrés, voient en eux des intercesseurs dont il est utile de se concilier la bienveillance sur cette terre, si l'on veut être assuré de leur protection dans l'au-delà. La plupart de ces chefs spirituels se recrutent héréditairement dans certaines familles. Beaucoup d'entre eux, chez les Musulmans et chez les Yezidis,

ont usé de leur influence morale pour jouer un rôle politique prépondérant.

LANGUE ET LITTÉRATURE

Le kurde se rattache au groupe linguistique iranien ; il est par là proche parent du persan, avec lequel il présente de nombreuses similitudes. Il comporte trois dialectes principaux, le kurmandji, usité au Nord et à l'Ouest, celui du Sud (parfois appelé sorani, ou baba kurdi) répandu dans la région de Suleymaniyé et à l'Est, le dumeli, ou zaza, qui a pour domaine les districts voisins de Kharpout et de Biredjik, ainsi qu'une partie du Sasoun. Les trois parlers se différencient par quelques particularités grammaticales, et de vocabulaire.

De nos jours, les périodiques, revues et journaux, contribuent puissamment à unifier la langue ; il en paraît actuellement quatre en Syrie (en kurmandji, et en caractères latins) trois en Iraq (en sorani et en caractères arabes), un en U.R.S.S. et un en Iran (tous deux en caractères latins).

La littérature kurde est tout à la fois très pauvre et très riche ; très pauvre si l'on ne considère que la littérature écrite, mais d'une richesse fabuleuse si l'on envisage la littérature populaire, transmise oralement.

La première, la moins intéressante, ne comporte que quelques oeuvres, en vers, toutes très marquées d'influences persanes. Les plus connues sont le Divan de Malayé Djeziri (XVe ou XVI^e siècle), le Mam o Zin d'Ahmed Khani (XVI^e - XVII^e siècle), pour le kurmandji ; les divans de Nali et de Hadji Qadir Koyi (XIX^e siècle) pour le Sorani. Mam o Zin, version poétique et savante d'une légende très répandue reste particulièrement remarquable pour l'époque à laquelle il fut écrit, par les sentiments patriotiques qu'il exprime. On en trouvera plus loin une extrait.

La littérature orale est d'une étude bien plus attachante que sa soeur savante ; il faudrait des années de travail pour recueillir tous les chefs d'oeuvre qui la composent. Le conte, les chansons d'amour, de guerre, de danse et de gestes en sont les principaux genres ; mais, tandis que les productions qui relèvent des quatre premières catégories sont également connues de tous, la transmission des chansons de gestes était, autrefois, et demeure encore, dans une certaine mesure, l'apanage de bardes professionnels, les « dengbéj », que l'on ne saurait mieux comparer qu'à nos troubadours du Moyen Age. Capables de réciter, sans défaillance de mémoire, des poèmes de plusieurs milliers de vers,

DIX ANS APRÈS

La Mort D'ALBERT 1^{er}

par CHARLES d'YDEWALLE (Suite)

Ni les études, ni le milieu familial ne l'avaient beaucoup préparé. Ni latin, ni grec, ni mathématiques générales. A 17 ans, quand il entra à l'École Militaire à Bruxelles, c'était un grand garçon fort peu cultivé. Longtemps après, quand il eût acquis, par la pratique des livres et des hommes, la haute culture qui seule complète la formation des grands esprits, il avait coutume de déplorer ce temps de la jeunesse, où on ne lui avait rien appris.

A tous ceux d'entre nous qu'il honora de sa confiance, il réserva de longs entretiens et nous pûmes découvrir en lui le plus extraordinaire autodidacte de notre époque, en géographie et en histoire, sa mémoire prodigieuse lui fournissait une documentation d'une sûreté inouïe. Tout l'avait porté d'abord beaucoup plus vers les sciences exactes et les machines. Il était de son temps. A quinze ans, il démontait et remontait des phonographes en un temps record. Quant à la botanique, il la pratiquait d'instinct, comme tous les Princes de la Famille qui, d'Albert Prince Consort d'Angleterre à Boris de Bulgarie, allèrent dans la vie, un hercier sous le bras. La culture humaniste n'était venue qu'après, quand le soleil de la vie eût mûri cette abondante documentation. Ripeness is All, dit le Roi Lear. Être mûr. Tout est là. A la fin de sa vie, le Roi nous déconcertait parce qu'il avait la passion d'Aldous Huxley et de Paul Valéry. Le milieu de son beau-père l'y avait poussé. La Reine Elisabeth, duchesse de Bavière, était fille d'un oculiste des plus distingués de Munich. Par là, comme par la Comtesse de Flandre, le Roi tenait de près à ce milieu de dynastes allemands demeurés très anti-prussiens, très éclairés, et, catholiques ou Voltairiens, toujours épris des Lumières. Le « Mehr Licht » de Goethe paraît être la devise suprême de leur tradition. Albert 1^{er}, qui avait manqué de racines grecques et latines n'en fut que plus tourmenté par le démon de la connaissance. A La Panne, dans l'intense mélancolie d'un séjour guerrier, il lisait, ses yeux de myope penchés sur des livres, et il passait de longues heures avec Vanderweide et Verhaeren, parce que le doctrinaire socialiste et le poète des heures claires l'intéressaient bien moins que les hommes de haute culture, qu'ils étaient l'un et l'autre. Avec eux s'élargissait le champ immense de la découverte. Ainsi s'établissait le contact entre la monarchie et le monde intellectuel, si particulier aux régnes d'Albert et de Léopold III. On les comparera aux plus belles époques des ducs de Bourgogne. En fait, ce sont des Princes universitaires dans la tradition du 18^{ème} siècle, libéraux et novateurs, très conscients de leur destinée auguste, mais à l'affût de toute nouveauté. On se rappelle l'intérêt que portait Albert aux ascensions stratosphériques du Professeur Picard dont il avait fait sa chose. Mais, au soir de sa vie, c'était l'avancement des Sciences en général qui le tourmentait, et toute la philosophie des événements.

Peut-être est-il heureux que lui, le philosophe, l'homme de famille, le Prince qui par une pratique constante de la politique avait acquis la pleine maîtrise de ses hautes qualités, soit tombé quand il était au zénith. Il avait horreur de la maladie, et ne nous le cachait pas. Bâti à chaux et à sable, il lui déplaçait d'être malade et tout traitement médical l'humiliait. La Providence lui réservait de mourir à soixante ans, sans souffrance, tout seul et sur la terre de Belgique. Il fallut une équipe de spécialistes du rocher pour que le roi Albert fut retrouvé, la nuit, au clair de lune entre deux rocs qui surplombaient la Meuse, quand le Royaume s'endormait.

Toute ma vie je me rappellerai ces entretiens en tête-à-tête dans l'immense bureau de Laeken. Un bureau improvisé, dans un salon démesuré, plein de meubles disparates. Une table immense chargée de dossiers et de livres, un fauteuil à sa dimension, une mappemonde et un canari en cage ; ceci n'était pas le moins inattendu de ce tableau intime. L'homme que haïssaient les grands problèmes d'histoire et de philosophie, qui discutait avec Einstein et Broglie, se tournait constamment vers cet oiseau des Iles, lui parlait doucement avec humour. Sur la table, dominant tous ses dossiers, ses portraits d'enfants et de petits-enfants souriaient.

J'ignorais qu'il eût sa chambre à coucher exactement à côté. Le dimanche soir, 18 février 1934, je fus invité à traverser le studio du Roi. Un dignitaire m'introduisit dans l'appartement contigu. Le Roi était là, mort, en grande tenue de Lieutenant Général. Deux petites religieuses, venues du quartier le plus pauvre de Bruxelles, égrenaient lentement leur chapelet, agencouillées, les mains jointes, à son chevet.

Les Anciens Combattants et les Associations les plus puissantes du pays envoyaient, en quantité, des oboles généreuses pour qu'un artiste élevât un monument à sa mémoire. Le Roi Léopold III recevant ces cadeaux, décida d'en faire une Bibliothèque. La Bibliothèque Albertine. Aux dons incomparables de la Loyauté et de l'Honneur, ce Roi avait ajouté ceux de la Science, et ce geste d'un fils élevant à la mémoire de son père une bibliothèque savante, n'est-ce pas le plus beau cadeau qu'une Dynastie puisse faire à l'esprit ? Tout homme, ici bas, se doit de laisser aux siens un message. Celui qui, dans l'accomplissement d'une fonction royale n'aura laissé que des Traités ou des Accroissements de territoires n'aura bâti que sur le sable des monuments que l'Histoire défile. Albert 1^{er} laissait à la Belgique un bien autre capital que les hommes sont libres de garder toujours, même aux heures les plus sombres de leur captivité : le Capital de l'Honneur et des Valeurs Spirituelles. Dans la grande tristesse du temps présent, aucune armée d'occupation, aucun zéloteur de l'Ordre Nouveau, ne les leur enlèvera.

Dix ans après sa mort, Albert 1^{er} demeure encore, et plus que jamais, une grande figure d'Actualité.

ils étaient aussi, à l'occasion, improvisateurs. Certains vivaient en vagabonds, d'autres étaient attachés à la cour des princes. Les compositions des « dengbéj » célèbres, pour la plupart, des exploits guerriers, mêlés d'épisodes amoureux. Beaucoup remontent à des époques très reculées, et leur intérêt historique ne le cède en rien à leur valeur littéraire, ils constituent en quelque sorte, les annales du Kurdistan.

Actuellement, la littérature kurde entre dans une phase nouvelle, grâce surtout à l'activité des revues, et l'on assiste peu à peu à la naissance de genres, comme

l'essai et la nouvelle qui, pour être diffusés par l'imprimerie, n'en restent pas moins populaires, car leurs auteurs se préoccupent avant tout d'être compris de tous.

LA SOCIÉTÉ KURDE

Bien que les multiples bouleversements qui suivirent la guerre de 1914-18 aient à peu près complètement transformé la physionomie politique du Kurdistan, il n'est pas sans intérêt d'esquisser un tableau sommaire de la société kurde, telle qu'on pouvait l'observer il y a une vingtaine d'années, telle qu'elle subsiste encore de nos jours dans certains pays.

ROBERT BURIEU
(à suivre)

CIROKA KURDI

SERBORIK

Paşa û Berdevkê Xwe

Dibêjin, carekî paşa û berdevkê xwe çûn gerê û rastî kalekî cotkar hatin.

-Paşa go: Kalo, qiwet bel

Kolo got: ser seran û ser çawan hatî

-Paşa go: Kalo, tu çire zû ne çandî?

Kalo got: paşa min zû çand û li berdas bû, teyrokê lê da û bir.

-Paşa go: kalo, dûvê te çawan in?

Kalo got: dûvê min bûne sîsê!

-Paşa go: Kalo dûtê te çawan in;

Kalo got: dûtê min nîzik bûne.

Paşa go: Kalo ezê qazekî bê pîr çikandin bişnim, qeno bipîrçikîn!

Kalo got baş e.

Paşa û berdevkê xwe hatin mal û

paşa ji berdevkê xwe pîrsî û got:

miu û kalo çi xeber daye, ji min

re bêje, an ezê serê te jêkim.

Berdevk bi dilekî kul, çû mal û

serhaff ji jina xwe re got: jina

wî go: here cem kalo û çi perê

bi xwe re bibe û xwe ji vî belayî xelas bike.

Berdevkê paşê rabû çû ba kalo û

ji kalo pîrsî.

Kalo got: te çi aniyê? Berdevk got: tu

çi bi xwazî, min ji te re aniyê û bi

Xwedê êdî, ji vî û pê ve pere li ba

min ne maye. Kalo go: bes e, ezê

gotinên xwe û paşa ji te re bêjim.

Paşa pîrsî, te çire zû ne çand,

yanî te çire zû ne zewicî, min got;

ez zû zewicim, lê zarokên min

mezîna bûn û mirin; paşa go, dûvê

te çawan in, yanî her du lingên te

çawan in, min go, dûvê min bûne

sîsê, yanî ez darek didim ber xwe,

paşî bi rê ve diçim; paşa go, dûtê

te çawan in, ya çavên te çewan

dibîne? min go, nizik be dibînim;

paşa go, qazekî bê pîrçikandin

bişnim, bipîrçikîne, eva tu ji min

re çand, min tu pîrçikand, perên

te min ji te standin. E. S.

SEVOKA HEÇI

Tew lo dilo, tim lo dilo, perîşano dilo...

Mîr Mehmûdê Cindî heya ko bi nav diyar û berwarine half ketiye, çû bû çikî hewle çî ye; ismê însana li welata tu ni ye;

Mîr Mehmûdê Cindî carekî wiha nêriye ko qîzek li ser devê rê li pêşiyê, sekiniye;

Heyanî ko Mîr Mehmûd gîha cem wê qîzê, hêdî wê qîzê desta vêt rişma mehîna wî ye;

Go: ya xortê qenc, Xwedê hebîna îşê te li van deran çî ye? Tu ji kû de tîyî, tu herî kû, ma hewala te çî ye?

Mîr Cindî ji wê qîzê re gotiye: Xwedê hebîna, tu rişma mehîna min berdî, rîya min dût e, taliya wê tuniye!

Wê gavê Çîçeka cînlî, ji Mîr Mehmûdê Cindî re gotiye; mesela xwe ji mî re bibêje, mî li destê xwe mala te xira kiriyê, tu dihinî, ismê aqîl, li serê te tu niye; ko tu soz bîdî, bi sozê mêrê berê, ez miradê te bikim bi Sêvoka Heçî, tu miu jî, li ser mehrî kim bi hêwtiye...

Wê gavê, Mîr Cindî li bejn û balê çîçeka cînlî nêriye, soz da ko—bi sozê mêrê berê—ko tu miradê min bikî bi Sêvoka Heçî, ezê, te jî li ser mehrî kim bi hêwtiye.

Wê gavê çîçeka cînlî li Tozo, Domo û Tûtîno kir qerîniyê...

Her sê ebîdê cinan, li wê derê hazîr bûyîyê...

Çîçeka cînlî emrî ser Tozo, Domo û Tûtîno kiriyê, go: honî rahejin Mîr Mehmûdê Cindî, honê berê wî bidin bajarê Tûnis û Xedra, honî wî li lenîştî bajêr deynin, mehîna wî bidin destê wî ye.

Wê gavê Tozo destê xwe li bin lingê Mîr Mehmûd xistiye, Domo rahiştiye mehîna wî ye, Tûtîno xurçîka zêra, di stoyê xwe de daniye, her sê ebîdên cinan, bi hewa kelîn, herê xwe dane ezmanê joriyê; heyanî ko ji reş ketin ji nû da, xwe ber ra ser bajarê Tûnis û Xedra dayiye, û li lenîştî bajêr daniye.

Wê gavê mehîna Mîr Mehmûdê Cindî teng û ber tengê wî jê re şidandin, teslîmî wîna kiriyê.

Mîr Mehmûdê Cindî mehîna xwe destkêşê xwe kiriyê; hêdî, hêdî, hûrik, hûrik dimeşiya; Mîr Mehmûdê Cindî wê gavê çû bû, nêrî ko şivanek li pêşiya wî ye; silav li hazîra kirî bû, li wî şivanî kiriyê.

Nehrî ko ev şivan yekî kalî rîspî ye, ismê bihna dirana di devê wî tu niye.

Ev kalo, çîças gulfî û gulbazî nêrî hemî bi ser bejna xwe de berdayî ye, Mîr Cindî gelekî bi

kalo fikiriyê; go: Xwedê hebîna kalo hewala te çî ye?

Kalo go: ya xortê delal, bimeşe

bi rîya xwe de, îşê te ji kalo çî ye?

Mîr Mehmûd go: Xwedê hebîna kalo, tu ji mîrê bêje, bê hewala te çî ye...

Kalo wê gavê ji Mîr Cindî re gotiye, go: kulê dilê kalo giran in, derdê dilê kalo, Sêvoka Heçî ye.

Wê gavê Mîr Cindî ji kalo re got: kalo sêvî li welatê me erzan in. Dinya, gava ko Mîr Mehmûd wîlo ji kalo re gotiye, kalo lê veşerand: ya Mîr Mehmûdê Cindî te ji min re digot tu ê dînlî, lê ê dînlî tu yl, ez ne ji sêva ra dibêjim, derdê dilê kalo bi Sêvoka Heçî re ye. Sêvoka Heçî qîzek e, dilê kalo ketiye... va heftî salê kalo qediyân, ezê li ber pezê bavê we me, ji heştê û heta heştê, Sêvoka Heçî tê bêriyê, çavê kalo lê dikeve, bihna kalo hebîkî biderdikeve.

Mîr Mehmûdê Cindî go: Xwedê hebîne kalo, ev Sêvoka Heçî qîzek ye, li kû ye, go: ev Sêvoka Heçî qîza Mîrê Tûnis û Xedra ye.

Mîr Cindî ji kalo re got: tu niha nayî ez û tu bazarekî bikin kalo go: ya xortê delal, hewala te çî ye? go: quncilê xwe bide min û ez ê xwe bidim te.

Kalo ji Mîr Mehmûd re go: çî mesele ye ko ez quncilê xwe bidim te û t'ê xwe bîdî min?

Mîr Cindî go: ez li cem te bim, ez miawiniyê bi te re bikim, aliye te şivaniyê bikim...

Mîr Cindî u kalo bazarek kirî ye, Mîr Mehmûdê Cindî kehrekî ji kalo kiriyê, ev kehîr rabû şerî kiriyê; hûrê wî ji nava wîna derxistiye, û hûr li serê xwe kiriyê; li cem kalo maye, aliye wî dîke şivaniyê.

Wey lo dilo... tim lo dilo, perîşano dilo...

Wê şevê Mîr Mehmûdê Cindî li cem kalo maye, bû sibe, baxwestê bêriyê, çêriya Sêvoka Heçî hat bêriyê, Mîr Cindî rabû li vî û li wî all, pez li ser destê çêriya Sêvoka Heçî girtiye; carekê Mîr Cindî hingûlîska Sêvoka Heçî berda binê satîla şîr, bi diziyê...

Çêriya Sêvoka Heçî, rahişt satîla şîr û ber bi malê dimeşiya...

Satîla şîr aniyê, li ber Sêvoka Heçî daniye, Sêvoka Heçî satîla şîr ber ra parzûn dayê, Sêvoka Heçî wîsa li parzûn nêriye, nêrî ko tiştê di binê parzûnê de xuya ye, lê nêrî, dît ko Hingûlîska Sêvoka Heçî ye; a ko wê û Mîr Mehmûdê Cindî pev guheriye!

Tew lo dilo, tim lo dilo, perîşano dilo!... (ne qediyaye)

PÊJINÊN DINYAYÊ

Xebat - Fidakari - Serfirazi - Serdestî



Dinya Zivistan e, Her Der Qeşa Girtiye; Waporeke Britani Karê Xwe ê Didevanî û Nobetdariyê Pêk Tîne



БЕЙ КОЛИ ГОНИ. БЕРИ В ПОЛОН!

Qiwetên Azahî û Serbestiyê. Leşkerên Rusî Êrîştî Neyaran Dikin.